Sal 2 — Hejmar 34

Duşemb 10 Kanûna Paşîn 1944

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET

## DEWRAN

CIVATA NAVNIJADÎN

### Sala nû wê Bibe

Sala dawiya vî şerî î· xedar, sala zefer û serfiraziyê û sala silh û aştiya cihanê, sala azahî û serbestiya hemî miletên dinyayê, çi biçûk, çi mezin.

Mareşal Smuts Radyoa Londrê de qala wan tiştan kiriye û gotiye: Piştî vî şerî divê teşkîlateki navnijadîn, civateke miletan bête danîn ji bona parastin û mihafeze kirina silh û aştiya cihanê û berevaniya miletan ji zilhm û t'adayê û Brîtanya Mezin, Emerîka, Sovyetistan û Çîn şerte ko bikevin vê civatê û bi wan îşan mijûl bibin; û bi yekîtiya wan her çar dewletan rahetî û selametiya dinyayê bêne pêk anîn; û miletên bêteref jî divê bikarin bibin lebatên vê civatê.

### Ji Welatên Bêteref

Qesd çiye, me xweş seh ne kiriye, lêbelê nas e ko piraniya miletên dinyayê ketine vî şerê mezin û ên mayîn ne bi navê Dewleta Bêteref, lêbelê bi yê şerneketî emel dikin.

Ji xwe ji bona parastina aştî û rahetiya dinyayê civatek danîn, ne tiştekî gelek nû û nûjen e. Ev fikir hema bi qasî dinyayê kevn e, ji ber ko zehf sedsalan berî dema Îsa pêxember, feylesofê çînî ê mezin Konfîçiyûs hîmên civateke nav nijadîn danî bû.

### Ev Fikir, Piştî

Çend hezar salan, bi destê Serekcimhûrê Emerîkayê lê berê hatiye vejandin; û dema çêkirina Bextnameya Sevrê de civatmiletek hati bû danîn. Mareşal Smuts qala vî civatmiletî û t'an lê kiriye û gotiye; milet bûyerên tarîxî ne, lê civatmiletê ko li Jenevê hati bu danîn ev rastî seh ne kiri bû.

Mirovdewletê Efrîka-Nîroyî berî her tiştî minêkarî kardariyeke navnijadîn e, ya ko bikare dîdevaniya selametiya miletan bike, heta dinyayeke rahet de, ev miletên he xwe bidin xebatê û li gora daxwaza xwe îşên xwe bigerînin û bijîn.

Ev fikir bêşik armanceke gelek spehî ye. Lê divê emê ji nû ve li bingehên Konfîçiûs binêrin. Tu kes qail na be ko karên miletên dinyayê bi destê çend hikûmetên mezin bêne gerandin; mîna malê şirketa ko ji hev belav bûye an iflas kiriye.

### Tevdîra Çêtir Dîsa

Ev e ko miletên dinyayê pev re ji xwe re civatek deynin û selametiya hemî miletan di girêdana xwe de, bibe yekîtiyek.

Lê divê hemî lebatên civatê armanca civatê bikin a xwe, qedrê qeydeyên danî bigirin û dema hewcedariyê de xwe ji kar û berpirsiyariyê ne din paş.

### Ji Aliyê Din Na Be ko

Miletên mezin, ji bona qesd û karên veşartî yên biçûk ji xwe re bikin alet, û ko îşê wan çû serî an dema zehmet û tengiyê hat, dev ji ên biçûk berdin. Civatê miletan yê ko dê bête danîn divê mîna şirketeke anonîm bibe, bi qeydeyê û qanûnên xwe ên xas û biserê xwe, da ko dema hewcedariyê de bikare îşine zehmet safî bike û ta'daker û neheqan bibêşine û zor bide wan.

Hêviya miletên cihanê ev e ko piştî vî şerî qeydeyên qanûnên heq û rastiyê hikimran bibin, ji xwe ev şer ji bona vî tiştî çêdibe.

J. B·

# QIBLEGAHÊ MISILMANAN



MEKE – BAJARÊ KO XWEDÊ LÊ HATIYE REHMÊ

## DERBINE NUH

LONDRE — Wezareta brîtanî a hewayî dide zanîn: Refên brîtanî ji bombeavêjên giran bihevketî, şevê çûyî dirêjî Berlînê kirine û du hezar ton bombeyên şewat û teqandinê avêtine hêjagehên payetextê elemana; agir cih bi cih bi vî şaristanî ketiye û pê şewatine mezin çêbûne, pêtî û dû û dûmanên wan şewatan ber bi ezmanan ve 6 hezar pê bilind dibûn.

Ji aliyê din bombeavêjên me ên din ji tîpê Muskitosan êrîşî axa Germanistana navîn û roavayî û Frensa Bakurî kirine û li hêjagehan xistine. Torpîl hatine reşandin şet û robarên dijmina. Ji wan êrîşan 20 balafir venegeriyane warên xwe.

## Bombardimanine Nuh û Dijwar

LONDRE— Bi awakî resmî didin zanîn: Refine mezin ji nêçîrvanên bombeavêj Heriken û Muskitosan bihevketî, duhî piştî nîro di Frensa Bakurî de li hêjagehên dijmina xistine. Balafirên Spitfeyir û Thenderbolts refên me dihemandin. Nexweşiya hewayî bernedida ko xesarên çêbûyî yek bi yek bêne dîtin. Balafirên Hevalbendan bi tevayî vegeriyane warên xwe.

Ji aliyê din refên emerîkanî ên xurt ji bombeavêjên mezin Kelehên Firok hevedudanî febriqe û karxaneyên Konyek, Ivrî û Bua Kolomb bombardiman kirine û di vê navê de 28 nêçîrvanên dijmina anîne xwar. 20 bombeavêj û 8 nêçîrvanên Hevalbendan venegeriyane warên xwe.

## 12.000 TON BOMBE

LONDRE— Meha borî balafirên emerîkanî yên ko di erdê Brîtanya Mezin de qerargeh girtine 12 hezar ton bombe avêtine hêjagehên Germanistanê û yên axa Frensa vegirtî.

PARÎS— Radyoa Parîsê elam dide ko balafirên Hevalbendan roja înê serê sibehê hêjagehên dora Parîsê bombardiman kirine.

LONDRE— General Montgomerî yê ko bûye Serfermandarê qiwetên brîtanî, ji bona vegirtina Ewripayê, hatiye Londrê û karê serdariya xwe xistiye dest.

MOSKÛ— Ordiya Sor Novo grad-Volînsk vegirtiye, ev bajar 15 kîlometir nêzingî sînorên polonî de ye.

### DIBISTAN

QAHIRE— Di Misrê de 332 dibistanên biyanî hene. 110 frensizî, 63 talyanî, 61 yewnanî, 51 brîtanî, 35 emerîkanî, 3 holendî, 2 elemanî û 1 Sviçereyî.

Di destpêka şerî de, her dibistanên frensizî de 1.100 mamosteyên frensiz hebûn.

### MERXASIYA WELATPERWERAN

MOSKÛ— Di şerê Rusya Gewir de ûrisên nijdevan ên welatperwer heta îro 234 hezar eskerên eleman kuştine, 3.677 trên xira, 2.571 pir berhewa kirine û 519 tang û otomobîlên pola kiraskirî, 234 balafir, 301 top, û 9 hezar kemyon û otomobîl ji hev de xistine û 449 depoxane û komgehên elemanî şewitandine.

CEZAYIR— Duhî komîte Frensizî a xelasiya welêt, di bin serekiya General De Gol de, civanek danî

MADRÎD— Hikûmeta spanyayê bi awakî resmî dide zanîn ko êdî di eniya Roheleêt de yekîneyên spanî ne mane, îrqeya spanî ya ko bi navê îrqeya heşîn nas bû bû, ev sê hefte ne vegeriyaye Spanyayê.

LONDRE—Duhî di ser axa Ingilistanê re sê balafirên elemanî hatine avêtin erdê.

# DEMA NIHA

MOSKÛ— Ordiya Sor Kirovograd standiye.

CEZAYIR— Leşkerên Hevalbendan San Vitorê bitimamî vegirtine.

LONDRE— Ji bona çêkirina sileh û cebilxanan di karxaneyên brîtanî de 25 milyon kes dixebitin. Îro deh roj in bombardimanên hêjagehên Germanistanê û yên Frensa Bakurî dom dikin.

## Sernivîsara Krasnaya Zvezda

MOSKÛ— Rojnama rûsî Krasnaya Zvezda qala sala borî dike û dibêje: Sala borî saleke çak bû, sala zefer û serfiraziyên me, meş û rewişa şerî guheriye, di eniya agir, şer û xebatê de karine hêja çûne serî. Sala 1943-yan sala êrîşên me bû; wê bi zefera Stalîngradê destpêkir û pey hev û du, di şerên dijwar de, leşkerên me serfiraz bûne, û çûne heta qeraxên Dnieprê ên rastî.

Dijmin ji welatê me tête derêxistin, bi awakî heta niha ne dî tî. Robelata azahî û serbestiyê, ji bona erdên hêj vegirtî jî, bin bi hin nîzingtir dibe; welatiyên me yên ko di bin nîrê dijmina de ne bi hêviya xelasê bihna xwe dibin.

Sermiyanên me ên eskerî û şerevaniyên me di pêşiya pirsên şerî ên dijwartir de jî xwe, sist nekirine û heq jê derketine. Şer û qomandên Kursk, Miyûs û Kievê bi tîpên zêrîn dê bêne nivîsandin ser rûpelên tarîx û dîroka cihanê. Şerevanî û xebatkerên me di xeyret û canfidakariyê de, ser ji hev û du standine.

Lê em bi dastanên zeferan xwe mest û serxweş na kin. Hêj şerine zexim di pêşiya me de ne. Şer ne qediyaye û zefer ne ketive destê me; lê belê divê emê zora dijminên xwe bibin, em dikarin zora wan bibin û bi rêberiya Stalînî bihayê wê her çi ji be, emê serbilind bibin. Serfiraziyên me yên sala 1943-yan gerewa zefera me ye.

MELBURN— Qerargeha Hevalbendan a mezin li nîro-roavayê Pesifîkê elam dide: di eniya Pozê Glosesterê de leşkerên Hevalbendan rê û dora serpira xwe firehtir û çeper û penahên balafirgeha Glosesterê qaimtir kirine.

Di şerên vê erdê de, bi hezaran kuştiyên Japonî li erdê mane. Di Nû-Gineyê de refên hevalbendan li qerargeha Japona ya Madangê xistine, ev cara pêşîn e ko Madang tête bombardiman kirin. Di qada Nû Gineya Holendî a bakur-roavayî de, bombeavêjên emerîkanî bi ser bendera Mano Kuariyê de girtine û waporên têde dane ber derbên xwe; 4 nêçîrvanên japonî yên ko dikirin têkilî bombeavêjên emerîkanî bibin hatine anîn xwar.

## Strana Kurdî

### LO DE LO

Lo de lo, lo de lo !...
Ezê bi geliyê goya diketimê,
gelîkî bi kevır û zinar e,
Fetuma bi sê denga ban dikirê
Xemrayê, xwîşkê
Ordiya nezama ingilîz giran e,
li dora malê me danîne çar kenar e
Xweş tê dengê topa û topxana,
di destê Hesenê Tahir de, xweş tê
dengê canbêzara...
Gelikî şahid û şihûdê Hesenê
Tahir hene, bi sê denga ban dikirê...
Huseynê xwarzê Mihemed Eliyê
bira...
Ezê îro kewê geliyê goya me,
ez beranê zozanxurî me, ez çirayê
mala bavê we me,
Nayê bîra we, rojê bi wê rojê,
minê li Ordiya nezama ingilîz qe
wimand, min hon xelas dikirin ji
beyreq daran.
Ez bi geliyê goya diketim, gelîkî
bi dar-incas e
Ordiya nezama ingilîz giran e,
li dora malê me danîne bê qiyas e
Xweş tê dengê topa û topxana
Destê Hesenê Tahir de xweş tê
dengê bêşataşa
Gelekî şahid û şihûdê Hesenê
Tahir hene, bêşataşê bi destê çepê
hiltînê, û bi destê rastê pakêta lê
diheşînê...
Bi sê denga ban dikirê Huseynê
xwarzê Mihemed Eliyê bira..
Nayê bîra we, rojê bi wê rojê
minê li Ordiya nezama ingilîz qewi-
mand, min hon xelas kirin ji es
kerê xasê...
Lo de lo, lo de lo !..
Ezê bi geliyê goya diketimê,
gelîkî bi dar-bî yê
Fetûma ban dikirê, Xemrayê,
lê xwîşkê
Ordiya nizama ingilîz giran e,
li dora malê me danîne bi sê ciya
Xweş tê dengê topa, topxana
Destê Hesenê Tahir de, xweş tê
dengê biçûk çapliya
Gelek şahid û şihûdê Hesenê
Tahir hene...
Bi sê denga ban dikir Husênê
Xwarzê, Mihemed Eliyê bira,
Digo : ezê îro kewê geliyê
goya me,
Ez beranê zozanxurî me, çirayê
mala bavê we me.
Nayê bîra we, rojê bi wê rojê,
minê li Ordiya nizama ingilîz qe
wimand ;
Minê hon xelas dikirinê ji
Ordiya.

### DEWRANÊ

Dewranê, dewranê
Zemanê me kanî dewranê,
Ezê bicara Stenbolê ketim
Bexçeyê wê sîmaq e
Mi dî şalûl û bilbila waq û waq e.
Minê deyn û bala xwe didayê
Koçk û serayê van siltana
Têde dihat dengê quran û yasîna.
Sala îsal mi dî bûye virvirê şûşê
mîrata vê eraqê.
Ezê bi cara Stenbolê ketim.
Carê ça dirêj e
Minê deyn û bala xwe dayê, koçk û
Serayê van Siltana
Têde dihat dengê quran û yasînê;
Mi dî siltan Ebdilhemîd bûye
Destmala li ser desta bi qirêj e
Zemanê, kanî dewranê.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞITIYÊ

## Xebat-Fidakarî - Serfirazî- Serdestî



Welatperwerekî Frensiz, Ew Êdî Ne Xort e, Lê Ji Bona Cengê Welatê Xwe, Xwe Pêk Aniye.



Leşkerên Hevalbendan, Leşkerên Azahî û Serbestiyê ne. Di Erdên Nû-Vegirtî De Qedrê Xelkên Xelas Kirî Digirin.



Serfermandarê Polonî Bi Dayîna Nîşanan Mêrxasên Riya Xelaskirina Welêt Serbilind Dike.

IMPRIMERIE DU JOURNAL LE MIROIR D'ORIENT

www.arsivakurdi.org

2ème ANNEE — LUNDI 10 JANVIER 1944 — NUMERO 14

# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

L'offensive d'hiver de l'Armée Rouge bat son plein sur le front ukrainien, où les forces du Général Vatoutine avancent en même temps vers le Nord-Ouest, le Sud-Ouest et le Sud, menaçant tout le Groupe d'Armées du Sud qui représente la moitié à peu près des effectifs de la Wehrmacht sur le Front Oriental.

D'autre part, des colonnes soviétiques ont pris cette semaine les bastions allemands de Novo grad—Volynsk et d'Olensk; déjà, elles ont franchi la frontière polonaise de 1939. Avançant le long de la voie ferrée Korosten—Sarny, elles ont pris Rokitno, 20 kms. à l'Ouest de la frontière polonaise.

C'est là un évènement dont l'importance politique n'échappera à personne. Les soldats nazis se rendent compte que le territoire de l'Allemagne n'est plus, pour l'Armée Rouge victorieuse, un objectif loinlain.

Plus au sud, les Allemands ont massé d'énormes effectifs au Sud et à l'Ouest de Jitomir, que les Russes viennent de libérer. Le Haut-Commandement Allemand espère ainsi éviter une double catastrophe, politique et militaire; car la destruction d'un grand nombre de divisions allemandes restées à l'intérieur de la boucle du Dniepr pourrait mener à l'écroulement du front intérieur dans les Balkans.

En même temps, d'autres armées soviétiques ont déclenché une nouvelle et formidable poussée sur le flanc sud de l'énorme saillant de Kiev et ont réussi à prendre les deux gros noeuds ferroviaires de Bielaya—Tcherkov et de Berdichev. Ces deux places d'armes, fortifiées depuis deux ans et demi, couvraient les dernières voies de communication restant aux mains des Allemands pour ravitailler le front de la boucle du Dniepr. Voila pourquoi les troupes allemandes ont âprement défendu ces deux villes, dont ils furent pourtant chassés après 4 jours de furieux combats.

Cette défaite a provoqué le désarroi dans le camp ennemi. Mises en déroute, les troupes allemandes reculent maintenant avec précipitation, toujours à la recherche de nouvelles positions défensives, naturelles des cours d'eau, par exemple, pour tenter de s'opposer de nouveau à l'irrésistible poussée de l'Armée Rouge. Mais il y a quelques jours, les Allemands annonçaient eux-mêmes que la neige commence à couvrir toute cette région. Et une fois gelés, les cours d'eau ne constitueront plus un obstacle contre l'élan actuel de l'offensive du Général Vatoutine,

Son avance est d'une rapidité étonnante. A Moscou, on l'appelle «Général-éclair». En effet, en 6 jours d'offensive, ce Général a su reprendre tout ce que Von Manstein avait péniblement obtenu en 45 jours, transformant ainsi la bataille en une marche victorieuse.

La propagande allemande cherche déjà a préparer l'opinion publique à de très mauvaises nouvelles. Elle parle de 750.000 soldats soviétiques qui attaqueraient maintenant dans la région de Jitomir. Et l'Armée Rouge, qui n'est plus qu'à 130 kms. de la Roumanie, exerce une pression irrésistible sur les forces de Von Manstein.

En Italie, les pluies torrentielles empêchent toujours le développement d'opérations de grande envergure. Toutefois, la Cinquième Armée, avec les troupes françaises à ses côtés, vient de déclencher une offensive en Direction de Rome.

Sur le Front Occidental, les aviations alliées pilonnent jour et nuit les fortifications allemandes tout au long des côtes et déversent des milliers de tonnes de bombes sur Berlin, sur Kiel et sur d'autres xilles du Reich. Apres avoir prêché si longtemps la doctrine de la guerre totale, les Allemands en goûtent maintenant toutes les horreurs. Serait-ce pour eux une salutaire leçon pour ne plus recommencer à troubler la paix du monde ?

Cette activité aérienne est considérée comme le prélude de l'invasion alliée, qui portera un coup mortel à Hitler. Les préparatifs de cette invasion gigantesque sont rapidement poussés. Dans une lettre adressée au Congrès Américain, le Président Roosevelt a déclaré Jeudi dernier que grâce aux décisions militaires prises à Téhéran, le jour de la victoire finale sera avancé et que l'année 1944 sera l'année décisive de cette guerre.

K. B.

## NOUS ACCUEILLERONS AVEC JOIE LA FRANCE REGENERÉE DANS LES CONSEILS DE L'EUROPE

Par le Dr **EDVARD BÉNÈS**
Président de la République Tchécoslovaque

*Venant de Moscou, le Président Bénès est arrivé à Alger ou il est l'hôte officiel du Comité Français de la Libération Nationale. Selon certaines informations, il serait en train de négocier le renouvellement du traité d'alliance franco-tchécoslovaque. A cette occasion, nous publions quelques passages d'un discours que le Président de la Tchécoslovaquie a récemment prononcé à récemment prononcé à l'Université de Manchester.*

Je suis un ancien étudiant non seulement de Prague, mais aussi de Paris. Je me rappelle comment Paris était fière de sa réputation européenne de guide et de créatrice d'une opinion éclairée. Comment peut-elle aujourd'hui justifier sa réputation ? Combien de ses meilleurs professeurs et instituteurs ont été destitués par de vils quislings intellectuels ? Qui est-ce qui professe actuellement dans la salle ou des étudiants, aiguillonés par la defaite de 1871, se pressaient en foule pour écouter Renan, un patriote qui refusait de croire qu'une défaite militaire était en elle-meme le signe de la dégradation spirituelle ? Leur pays avait été vaincu, mais ils pouvaient toujours servir la puissante Communauté de la Science et des Lettres.

Paris, nourrie depuis plusieurs siècles de l'érudition et de la culture profondes de ses savants, a fait face à son épreuve avec courage et intelligence. Je pense que le jour est proche ou le peuple français jouera une fois de plus un role total dans la guerre contre les agresseurs. Mais si nous avons abandonné la politique erronée que nous pratiquions envers la Russie Soviétique, nous dévons être soucieux d'éviter la répétition d'une politique similaire envers la France, Comme la Russie dans la dernière guerre, la France en était venue à un arrangement humiliant avec l'ennemi. Même aujourd'hui, celui-ci n'a pas encore assouvi sa dernière parcelle de traitement humiliant et de vengeance. Il a déchiré et réduit en pièces l'Armistice. Pourtant la France n'a jamais cessé d'être capable de grandeur. Les Français Combattants et les récents événements montrent sa qualité de direction. La régénération de la France est en train d'être accomplie d'une manière très différente de celle envisagée par le maréchal Pétain. La jeunesse française est emprisonnée ou astreinte aux travaux forcés pour le compte de l'ennemi exécré. Mais l'opinion française s'est montrée à la fois trop forte et trop intelligente pour être ingnorée des Nazis. Je crois que la France entrera de nouveau totalement dans la guerre aux côtés des Alliés. Nous accueillerons avec joie cette France régénérée dans les conseils de l'Europe, au plus proche moment possible.

La Russie Soviétique et la France constituent des facteurs essentiels dans l'équilibre européen et continental d'après-guerre. Nous sommes convaincus que l'existence d'une France puissante sur le Continent, collaborant avec la Grande-Bretagne à l'Ouest, et l'Union Soviétique, la Pologne et la Tchécoslovaquie à l'Est, est essentielle et qu'il est nécessaire que cette France soit avec nous tous au moment de la signature de l'armistice. Le derniers événements confirment nos prévisions.

NEW-YORK (A.F.I.)— Plusieurs conversations anglo-américaines ont eu lieu hier notamment entre Lord Halifax et Cordell Hull. On croit qu'elles ont porté sur la possibilité de l'application à l'Argentine de sanctions économiques dont l'efficacité dépendrait de la participation de l'Angleterre.

Certains correspondants de journaux inclinent à croire que les entretiens ont eu pour objet la prochaine conférence de stabilisation militaire.

## POEME KURDE

### Dans l'ombre

Comme une fille coquette rit
le bourgeon
Le vent est une cloche qui sonne
Tendrement
Dans les corolles des tulipes
et des roses
Sous les arbres il y a des palais
d'ombre
Les planchers sont couverts de tapis
de vermeil
Et l'astre jette aux coins sombres
Des miroirs dorés.
Sur l'eau de la rivière
Volent des papillons mauves,
Des flammes dorées, des écumes
Que les rayons du soleil allument.
La source jette son âme pure
L'eau couvre des gazons tendres;
Heureux, rit le bourgeon
Le vent est une cloche qui sonne
Dans les corolles des tulipes
et des roses.

UN AIMABLE ÉCRIVAIN

## PAUL ARENE

— 2 —

*Mais la santé de Paul Arène se trouva ébranlée, et à plusieurs reprises, une ordonnance de soleil lui fut prescrite. Aussi Arène quitta-t-il, avec regret a Paris. ses rues et ses jardins, mais aussi ses brumes, pour s'établir dans le Midi, à Antibes.*

*C'était en 1896. Le 17 decembre au soir, après avoir fait un tour sur les remparts qui dominent la mer, là où s'entend le bruit des calanques, «le glouglou des rochers creux s'emplissant et puis se vidant au lent va-et-vient de la vague», Arène remonta dans sa chambre, à l'hôtel.*

*On l'y retrouva le lendemain matin, la plume échappée des doigts et le front son grand front, posé sur la copie qu'il destinait au Journal. L'article à peine ebauché s'intitulait «Le Moine des d'Or...»*

*Ainsi mourut Paul Arène, ce grand ouvrier des Lettres Françaises ce spécialiste de la douceur de notre langue.*

*Ses restes furent ramenés à Sisteron et déposés sous les herbes et les roches qu'Arène avait tant aimées, avec l'épitaphe suivante :*

*«Je m'en vais l'âme ravie.*
*«D'avoir rêvé ma vie.»*

Léo Leroy

## FÉVRIER

par KAREL TONAN

Toi qui aimes le silence et la solitude;
toi qui, dans la profondeur des forêts et la paix des champs sous la neige.
Ecoutes le rythme de la vie,
n'entends-tu pas parfois
la voix des abimes?
Dans le lointain retentit un carnaval de meurtres, de sang d'agonie,
Le silence de la terre est un supplice
Mais au-dessous
les battements d'un coeur palpitant
et. du fond des ténèbres, une source cachée
monte vers la lumière.
Or, la chanson des jeunes yeux enivre ton coeur
et grise ta tête du bonheur
de penser que. si nous sommes seuls dans le désespoir,
nous ne le sommes pas dans la foi,

www.kurdipedia.org

# 145.000 BALAFIR

WEŞINGTON - Di nav panzde mehên ko di pêşiya me de ne, karxaneyên emerîkanî 145.000 balafiran wê çêkin.

LONDRE— Li gora texmînên nûçegihayên eskerî, yên ko li Moskovayê ne ji destpêka şerê Uris û elemanî û heta niha 8 milyon eleman hatine kuştin an hêsîr girtin.

CEZAYIR— Radyoa Cezayirê dide zanîn: di bakurê Ortanayê de şerine zor û xwîndar dom dikin; ev der du mîl di nîroyê San Tomasoyê de ye.

# Bombardimana Sofyayê a Nuh

BUDAPEST— Radyoa Budapeştayê alam dide ko duhî bi ro Sofya hatiye bombardiman kirin.

WEŞINGTON— Têtê texmîn kirin ko par 822 gemî. yên Hevalbendan hatine xeriqandin, 771 hebên wan li Etlantîkê.

CEZAYIR— M. Duf Kûper û xanima wî Ledî Kûper duhî hatine Cezayirê. M. Pavlaskî bi navê General De Gol çûyê balafirgehê, pêrgîna wan.

# 25 MILYON TON

WEŞINGTON— Destgehên emerîkanî par 1896 wapor çêkirine; hemî bi hev re 19 milyon 239 hezar û 360 ton mezin. Emîral Lend gotiye ko destgehên emerîkanî dikarin her sal 25 milyon ton mezin wapora çêkin.

MOSKÛ—Jitomir, asêgeha erdê Kievê a dawîn jî, ketiye destê Ordiya Sor. Du kelatên din ko di riya Romanyayê de ne,—Berdiçev û Bielaya—Çerkov tengiyeke giran de ne; eskerên General Vatutînî dora wan digire; ko ev her du bajar û asêgeh jî hatine vegirtin, di pêşiya Ordiya Sor de, riya Balqanan dê vebe; û halê leşkerên elemana di enişka Dnieprê de, wê bibe halekî bê hêvî û niyaz.

Ji aliyê din qiwetên General Malînsovskî di nav 48 saetên dawîn de, gelek gund û avahîgeh standine, û di eniyeke dirêj û pehin de ber bi Nikopolê ve dimeşin.

# Dr. BENES

CEZAYIR— Serekê Çekoslovakyayê Dr. Benes xwe ji Cezayirê hilaniye, zehf mirovdewletên mezin di balafirgehê de jê xatir xwestine.

LONDRE— Noqoveke holendî di avên Norvecistanê de, dirêjî qeflewaporeke dijmin kiriye, 3 derb rast bi rast li waporên neyaran ketine.

LONDRE— Duhî di Londrê de hatiye elam dan ko gava qriwazora elemanî Şarinhorst hatiye xeriqandin, noqavek û du destriyorên elemanî jî yên ko dihatin arîkariya Şarnhorstê bi derbên yekîneyên brîtanî ên behrî hatine bin av kirin.

LONDRE— Şevêdî refên brîtanî ji Muskitosan bihevketî ji nu ve dirêjî hêjagehên erdê elemana kirine. 6 nêçîrvanên dijmin hatine avêtin erdê, mekîneke hevalbend ve negeriyaye warê xwe.

# XERITA SOVYETISTANÊ




ENIYA SOVYETÎ. ENIYA KO TÊ DE CENGÊN DINYAYÊ ÊN XURT Û ZEXIMTIR ÇÊDIBIN.

## XERITA ITALYAYÊ




Ordiyên Heşt û Pênc Ber Bi Romayê Ve Dimeşin.

LONDRE— Li gora nûçeyên ko hêj ne hatine xurtandin Hitler Ribentrop ji wezareta dervekariyê rakiriye û Dr. Şaxt xistiye dewsa wî.

## Balafirhilgirine Dijwar

PAR 65 GEMIYÊN NUH HATINE ÇÊKIRIN

Weşington — Par destgehên emerîkanî 65 balafirhilgir çêkirine. 6 hebên wan 72.000, 9 hebên wan 10.000 ton mezin, ên mayîn balafirhilgirên arî kar in, yên ko qelflewaporan dihemînin, jê pê ve sala 1943-yan de ji bona stola Emerîkanî 13.000 balafir hatine çêkirin.

Melburn — Qerargeha Hevalbendan a mezin li Pesîfîka miro-roavayî elam dide: di axa Nû-Bretanyê de li hêla Pozê glosesterê şerine no çêdibin. Duhî ji 600-î bêtir kuştiyên japonî li erdê mane. Di Kaviangê de bombe û torpîl li du destriyorên japonî ên din ketine. Di Nû-Gineyê de leşkerên emerkanî yên ko derketine Saîdorê 15 kilomêtir bakur roavayê Mandangê de dirêjî japona kirine. Li gora ejensa elemanî, ewistralî Pozê Gumbiyê de jî,pê li erdê kirine.

Qahire — Di Qahirê de kinsolosxaneke sovyetî hatiye danîn.

# Serek Benes - General De Gol

CEZAYIR — M. Benes, Serekcimhûrê Çekoslovakyayê duhî hatiye Cezayirê û çûye qesra General De Gol. Têtê bawer kirin ko her du mirovdewlet li ser pirsa nûkirina bextnameya frensiz û çekoslovakî a dostaniyê baxevin.

NÛ-YORK— Sergerînendeyê bajarê Nû-Yorkê M. Laguardiya gotiye:na keve serê min ko em bikarin Hitler sax bigirin; ko dema tengiya dawîn hat peyayek ji yên dora wî, wî bikuje.

QAHIRE — Welatperwerên sloven di Dravogradê de pirek berhewa kirine.

## JITOMIR KETIYE DESTÊ ORDIYA SOR

MOSKÛ— Di şerê Jitomirê de, yekîneyên elemanî ên mezin ji tang û peyadan bi hevketî yekcar perîşan bûne; di dirêjahiya vê eniyê de, leşkerên elemanî xwe bi şûnda dikişînin.

LONDRE— General Karil Spatz; Serfermandarê çekê emerîkanî ê hewayî, ji bona eniya diwemîn, ji Efrîqa Bakurî hatiye Londre.

## 86.000 NÊÇIRVAN & BOMBEAVÊJ

NÛ-YORK— Îsal destgehan 1861 gemî, û febrîqeyên emerîkanî 86 hezar balafir çêkirine. Par wan karxaneyan 48 hezar û di sala 1941-î de bîst hezar balafir çêkirî bûn. Ji polaxaneyên emerîkanî îsal 90 milyon ton pola derketiye.

CEZAYIR— Radyoa Frensê elam dide ko Ordiya Pêncemîn Punta Fîume vegirtiye.

## Derbine Nuh digehin Japona

NÛ-DELHÎ— Di ser Arakanê re şerekî hewayî çêbûye, balafirvanên brîtanî 13 mekîneyên japonî xistine erdê; 8 bombeavêj û 3 nêçîrvan. Tu xesar ne gihaye balafirên brîtanî.

WEŞINGTON— Serek Rûzwelt di peyiva xwe a sersalê de gotiye: leşkerên me ji bona êrîşa eniya mezintir kom dibin. Mr. Kordel Hal gotiye: hemî emerîkanî ji bona zeferê divê hêj bêtir bixebitin.